

## RIKU ji bo hemî qurbanîyên qaçaqxçitiya mirovan û awayên din ên kedxwariyê xizmetan pêşkeş dike

### Gelo ji yê jêrîn yek bi serê we an kesekî nêzikî we hatiye?

- Ma kesek zextê li we dike ku hûn tiştek neqanûnî bikin an tiştek din ku hûn naxwazin bikin?
- Ma kesek (wek mînak hevjin, xizm, kardêr) tiştên ku hûn dikin an danûstendina we bi mirovên din re kontrol dike?
- Ma ji we re hatiye gotin ku hûn ji ber hatina we bo Finlandiyayê deyndarê kesek in an berê we drav daye kesekî?
- Gelo ji we re hatiye gotin ku heke hûn guh neden, hûn ê werin dersînorkirin an destûra rûniştinê xwe ji dest bidin.
- Ma kesek we bi parvekirina agahdariya kesane ya we tehdît dike?
- Ma hûn ditirsin ku wekî mînak kardêr an hevjinê we zîrarê bide we an kesên nêzikên

we heke hûn bi wan re nerazî bin an dev ji kar an têkiliyê berdin?

- Ma hûn di derbarê karê ku hûn hatin vir ku bikin an mercên wê de hatin xapandin?
- Ma soz dane we ku maaşek zêdetir ji ya ku niha bi rastî tê dayîn bidin we?
- Ma hûn normal ji heftê pênc rojan an rojane ji 8 demjimêran bêtir bê mûçeyek zêde kar dikin?
- Ma kesek li ser navê we drav an tiştek qerz kiriye an hûn neçar kiriye ku belgeyên ku we jê fam nekiriye îmze bikin?
- Is someone using your bank account or controlling your finances?
- Ma kesek hesabê bankê we bi kar tîne an darayîya we kontrol dike?

**Heke we bersiva Erê da yek an gelek ji van pirsan**, ji kerema xwe bi **help@riku.fi** re bi her zimanî têkilî daynin an bi yek ji hejmarên li ser malpera **riku.fi/trafficking** re têkilî daynin.



**040 632 9293**



RIKOSUHRIPÄIVYSTYS  
BROTTSOFFERJOUREN

**Rêxistina Piştgiriya Qurbanîyan Li Finlandiya (RIKU)** qurbanîyên sûc, kesên nêzîka wan û şahidên sûcê rêber dike û piştgirî dide wan.



SERHÊL/ONLINE



BI TELEFON



RÛ BI RÛ

## Bi me re têkilî daynin, heke:

- hûn qurbaniyê sûcekî bûne
- hûn şahidê sûcekî bûne
- Kesên nêzîkên we qurbaniyê sûcekî bûne
- Hûn guman dikin ku hûn qurbaniyê sûcekî bûne û dixwazin serpêhatiyên xwe nîqaş bikin û / an jî şîreta pratîkî bistînin.

Karûbarên me bi tevahî nehênî ne. Hûn dikarin bi têlêfonê an serhêl bi me re têkilî daynin – her weha bênav. Her wisa hûn dikarin li yek ji buroyên me hevdîtinek rû bi rû bixwazin. Em ê bêyî razîbûna we di derbarê doza we de agahiyê nedin kesî.



### SERHÊL/ONLINE



Malpera **Riku.fi** di derheqê RIKU û derbarê pêvajoya tawanana de bi zimanên cuda agahiyana dide.



Ger hûn guman dikin ku qaçaqxçitiya mirovan an kedxwariyê tê kirin, ji bo piştgirî û şîretê ji **help@riku.fi** re email bişînin. Hûn dikarin bi zimanê xwe binivîsin.



**RIKUchat** xizmetek yekser û bêdereng e ku piranî bi zimanê Fînî ye. **riku.fi**



### RÛ BI RÛ



Buroyên RIKU li dora Finlandiyayê belê piştgiriyê pêşkeş dikin. Em dikarin tercûmanek ku nepenîtiya we diparêze bi kar bînin. Agahdariya têkiliyê li ser malperê **riku.fi** ye.



Her weha hûn dikarin kesekî piştevan bixwazin, ku bikare bi we re hevdîtinê bike, nîqaş bike û şîreta pratîkî bide we. Her weha ew dikare bi we re were qereqola polîs an dadgehê.



### BI TELEFON

#### **XETA ALÛKARIYA NÎŞTIMANÎ 116 006**

Duşem –Înê 9 AM heya 8 PM (piranî bi Fînî)

#### **Xeta Alûkariya Şêwmendiya Qanûnî**

**0800 161 177**

Duşem – Pêncşem ji 5 PM heya 7 PM (bi Fînî)

RIKU rêxistinek nehikûmî (NGO) ye ku girêdayîyê çî aliyekê siyasî û olî nîne.

